DÎTINEK JI DER VE

Li dijî Darwînî

Di van salên borîn de, têrmekê nû bi navê Neqşê Şehreza (Intelligent Design) yê bi lez li Emerîka belav dibît. Li wîlayetên; Ohio, New Mexico, Minnesota, Kansas û Pennsylvania, Neqşê Şehreza bi fermî cihê xwe di nav xandina zanistî de kiriye.

Neqşê Şehreza têseka zanistiye pêkolkê diket cihê têza zanayê bi nav û deng Charles Darwîn bigirît. Herwek dihête zanîn, têza Darwînî, dibêjît ku guhorînên jînewerên zêndî li ser erdî ji êk şane ya despêkî çê boye. Mirov bi vî terzî yê ji ginaweran veqetay û hêdîhêdî boye xudan hizr û bîr. Têza Darwînî bi navê "Werara Terzan", ya ku pitir wek "Evolution" dihête nyasîn, nuke di perwerde û fêrkirina zanistên xweristî de cihê xwe kiriye û li xandingehên gelek welatan di hête xandin.

Têza Darwînî felsefa çêbûna jiyarê bi berovajî boçonên ayînî di dete zanîn. Darwîn dibêjît mirov yê bi boyerên xweristî, ku bi sal u zemana li ser erdî rudayn, ji jiyareka despêkî ya êkşane boye ginawerekê avî, paşî canewerekê çardest û jinuka di zincîra peydabona meymunkê re derbaz boy heta mirovê nuke jê çêboy. Berovajî, ayîn di bêjin ku Xudê raste û rast mirov yê ji axê çêkirî.

Nuke, li duv têsa Neqşê Şehreza, taqeteka şehreza û çêker dinya hemû ya danay. Çi tişt ji xwerayî an xweristî çênebûyne. Ew taqeta mezin û çêker ya ku li dûv têsa Neqşê Şehreza mirov û canewer û ginawer û darûbar û stêr û esman...htd çêkirîn, boçûnên felsefa ayînî di înîte bîra mirovî, ewa ku jêra di bêjin Creationism (anko Çêkirin). Têza çêkirinê (ne çêbonê) di bêjît ku ji destpêkê hemî tişt wek mirov, meymûnk, kirm, mêş, masî, darûbar...htd, her êk wekî xwe yê bi destêt Xudê hatiye çêkirin û her ji destpêkê û heta nuke her wekî xwe mayne, ne wekî Darwîn dibêjît ji terzekî boyne terzekê dî. Li ser vê çendê em dişêyn bêjîn ku Neqşê Şehreza nêzîkî felsefa çêkirinê di bît, lê ne naziknaveke (eufemisteke) ji bo wê. Anko Neqşê Shehreza neku piştgîriya felsefa ayînî diket, herwekî hindek kes û bizavên ayîndar li Emrîka dibêjin. Li welatên rojava zêdetir gropên rexperist (fundamentalist) yên kirîstna barê felsefa Çêkirinê û ya Neqşê Şehreza yê helgirtî. Lê em dizanîn ku li piraniya welatên îslamî jî têsa Darwînî ya biveye.

Roja 26ê îlona 2005ê dadgeha bajêrê Harrisburg li Filadelfiya daxaza 11 dayûbaba dijî xandingeha bajêrê Dover xiste berçav ji ber ku xandingeh zarokên wan li ser Neqşê Şehreza şûna têza Darwîn fêr diket.

Gelo! Xandingeh li Kurdistanê li ser çi têz, zarokan fêr dikin?!

Dr. Ebdulbaqî Mayî